

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erden Sûriye à Libnané. 35 İfreyen Sûr; ji bona welatén din 4 İfreyen ingilz. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Ú GERİNENDE: MİR Dr. KAMIRAN ALI BEDIR-XAN

KURDISTAN

- 2 -

Di sedsala XVII hemin de, bextreziya Kurdistanê destpê kiriye. Mîlelê kurd, yê ko şerî Hiltî, Asûrî, à Mongol kırı bû, yê ko Med à Asûriyên qidretkî, di nav xwe de, helând bû, ëdi diviya bû, li gora silûda serên crânên xwe, ji alîk bîkeve alîlik din. Sê sadsal pê de, şerî Tirk à Eceman à di pişte re, cengê Tirk à Ürisan, xesarine dijwar gihandine njadî Kurd.

Ber bi sala 1650-an ve, tirk hemî erdî Kurdistanê, kêm à zede, xistî bûn bin hikmê xwe à karêne Kardistanê bi Stanbolê ve da bûn girêdan. Kurd pê qall ne bûn à li Tirkan rabîne. Di sala 1666. de, kurd Sêzeki, bi navê Mehdiyî à Osmaniyan ase bû. Dawi ket destê hikmîtelê à mukir hat ko qesda wi dantina « Kar distaneke Mezin » bû.

Di sedsala XIX hemin de, Kard ji firsendîn şerî Tirk à Rûsi, parmed bûne à bi mihaicir ketîne erdî Hikmetta Rûsyayê; ya ko li her dilê wan şîrin bû. Karda ji crânên xwe ên meshtî à ji filan ji, hez dîktîn. Ebdîl-Hemid, bi qesda xirakirina vê dostanî, di sala 1890. ji siwärne Kurdan, şirgeyîne hemdiye dan çekirin, yên ko di bin emrî Sîltan de bûn; à pê di nav kurd à filan de, tiştîn zehf nezzew çebîne. Ev kurdên hemîtelê, pêşveçîna mîletê kurd à riya welâ à mîlet perwîye de dereng hîstîne à dijimîntîn xistîne naubira Kurd à filan.

Lê, di sala 1909. de, pişti ji textketîne Ebdîl-Hemid, şirgeyîn kurd, hatine rakirin à serekên kurd, bi awaki çak, desti bi rôberiya mîletê xwe kirine à mebhûs à ayânîn kurd di civatmîletê tirkî de, à der civatê Osmanîyan yê maqûl à rîspîyan de, ji bona heqen mîletê xwe zehf xebîlinne.

Ji alîgî din, Kardan bi Stanbolê de, der Bexde à Mâsîl rojname derdixistîn à cîvat dantîn, bi qesda parastîna heqen kurdan à pêşveketina zimanê kurdî.

Di wextê ko kurdan ji bona vejanîna mîlelê xwe ji bona pêşveçîne njadî kurd, cehâline mezin dikirin, (â ji xwe li gora qeydeyîn dant, mîlet hemî serbest in à dîkarin li gora daxwaza xwe hikûmetekî deygnin) mîleten mezin bi parkirina Kurdistanê mijîf dibûn à il ser para ko dihat de, at anîl bazar dikirin.

Li 17-ê şîrîya berî, sala 1913-an de, Stanbolê lihevhâlinek hatîye morkirin à kardariye çarşeri, ji nimînendeyen Tirkye, İran, Ingîllîstan à Rûsyayê, bihevketî sinorîn Kurdistanê dîkişandin, à pê dilî her car dewletan, kêm à zegde, xwez dibû.

Kurdistan Sala 1914-1918 an de

Serî 1914-1918-an, rî dida kurdan, à wan ji nû ve desî bi xebata azahî à biserebhîna welatê xwe kirine. Bu li vit serî, rast bi rast ne bendewar bûn. Lî bi firsenda ko ketîne destê wan emel kirine à li Serchedan à li Kurdistanê niroyî de, li hikmetta rabîne. Di wan şer à komandan de, xesarine dijwar gihage kurdan. Karda zwîna xwe dirîjandin, à mîna mîleten din bawer dikirin à di hîvîye de bûn, ko azahî à serbestî wê bibe para her mîletî.

Pişti ko Hevalbendan serfiraz bûne; kurdan li her derî, cîvat à komîteygîne azahî à serbestî wê bibe para her mîletî.

Pişti ko Hevalbendan serfiraz bûne; kurdan li her derî, cîvat à komîteygîne azahî danlî. Di 22-ylê adarê sala 1919-an à li 1-ylê adarê sala 1920-an li ser pîsa welatê xwe, da biranî qedimandine pîvoka silîh aşıtîya cihane, ya ko bi dantîna silîh mijûl dibû; di van biranîyan de, heq à daxwazîn kurdâ yek bi yek nîvîsandi bûn, à pê re zerîtekî ko erdî Kurdistanê pêşavvan dikir, hebû.

Bextnameyê Sevîr, sala 1920-an, bi dantîna hikûmetekî kurdâ, mukir dihat; à li gora serîn ve bextnamey, Kurdistanê Nîroyî; ayo kurdan Iragê, heke xwestin, dîkarin xwe bigîlnîn, aya mader a bakur à nîveki.

Bextnameyê Lozanî-dî nav bira Tirkye à Hevalbendan de; Sala 1925-an, ji bona Kurdistanê-â ji bona qeydeyîn azahî à serbestîya daxwazîn mîletan- saleke giran bû, Civatê Miletan Mâsil à Iragê.

Di mehâ Sîbalî de, der pişgîn Tewrosê în navîn, kurdâ ji bona azahî à serbestîya xwe, dest avîline çekê xwe. Şex Seldi di destpêk de serfiraz bûye, à zehf bafar à şaristan vegirîne; li dawî Ordîgen Tirkan, zora wi birine. Tirk di Dîgarbekrî de, mehkemeke eskeri dantîne, bi gerara vê mehkemî Şey Seld, Dr. Fuad, Ewigat Ezzî, Yuzbaşî Kemal Fewzî, Seyid Evdîl Qadir à kurê wi à 60 serekên kurd halîne bi darve kîrin.

Mîranti, bextnameyîn navnijadîn, heg à edalet, qeydeyîn azahî à serbestîya mîletan, pêşîya ot tîstî ko jê re qîwel dibêjîn, bêmecal mane.

PESİYA KURDISTANË

İro, kurd ji nû ve, ji cîhê xwe rabâne à bi dengeli xuri, doz à dehwa azahî à serbestîya xwe dîkin. Zehf kovar à rojnameyîn di wan heye, mîna: Kurdistan n Gelawê, Jîyan, Dengî-Kîltî-Taze, Nîşîman, Zegroş Kâhistan, Hawar, Rîya Taze, Azaî, Ronahi, Kovara Qefqasî, Sîr, Roja Nû.

Lê heke dewletan mezin bala xwe ne dan pîsa Kurdistanê an bi dilekî reş lê nérîn; gelo dawîya wê xebata zor wê çebîbe !?

Mîna hemî mîletan bîcûk, pêşîya Kurdistanê ji, bi da liştan girêdayîn ye, yek: zexmî à zêrekîya xebata ko kurd ji bona azahîya xwe dikinâ didoa; qeder à mîlen bîyeren siyaset ên mezin yên Cihane.

Mensûr ŞEL-LİTE

ME BIHISTIYE

— Sala ko bê karxane, ên emerikanî car milion otomobîla çekin.

— Panzde hezar eskeren emerikanî ketîne axa Tokyoyê; payetextê japonâ. — Seffîren Britanya Mezin, li ba dewleten Rohelatê Nizing à Navin, di serekiya wezirî britaniî è dervekaryî de, li Londre civanek danine à bi pîsîn ko bi van welatân ve girêdayî ne, mijûl dibin.

— Xelkê Sûdanî; erdî ko li niroyê Misrê de ye, dixwazin karêne welatê xwe bi destê xwe biggerinîn û naxwazin karkeren misri û ingilîzi tekili şuxî Sûdanî bibin. Xelkê Sûdanî dildikin bi Hikûmeten Ingilîzi à Misri tîfaqnameyeke mîbikin. Piranuya xelkên Sûdanî resîn in.

— Wezirîn dervekaryî yên pênc dewleten mezîn di Londre de civanek danine. Pênc dewleten mezîn ev in: Emerika, Sovyetistan, Britanya Mezin, Frense à Çin.

— Pişti ko japonâ xwe avetîne bextê Hevalbendan ekere büye ko stoleke emerikanî a xuri ji bûne ériya dawîn, xwe kar kîrî bû.

Ev stol niho bê şer ketîne avên japonâ ên mader. Ev ia yekineyê têde: 14 zirehpûs, her yek ji wan 35 à heta 45 hezar ton mezîn; 24 balaşîrîhîgir, 22 qîwazorîn giran û sivik, 136 destriyor. Hezar û sê sed balaşîr dora vê stolê de difirîyan.

— Leşkeren emerikanî ketîne Şanghey; bendera çini à mezîn.

— Serekdewletê frensî, li ser vexwandina serekcimbûrî Emerikayê M. Truman, çû bu, Weşingtonê. General De got, niho vegeriyyate Parisê. Tête gotin; beriya ko ev sal biqedê Serekcimbûr Truman wê hê Parisê; xalîrxazîn mîletê frensîyi à ya General De got.

— Li gora danazana ko hatîye belav kirin; serekdewleten emerikanî à frensîzi li ser hemî pîrsen ko di nav van dewleten de hene, li hev hatine à qerara sidandina dostanî à tevkarya her du hikûmetan, dane.

— Meha borf270.000 eskeren emerikanî ji erdê Ewripayê vegeriyyane welatê xwe; vê mehê, tête dawer kirin ko 400.000 eskeren emerikanî, wê bikarin xwe ji erdê Ewripayê hilîn û berê xwe bidin Emerikayê.

— Herweki şer qedîya ye û xarkxane à desighehî emerikanî dest ji çekirina çek û sileh û cebîlanan, û hesincawê seri ên din; mina top, balaşîr, bombe, avêj û cengkeşîyan berdane, divê rebat bête pêda kirin, xebatkeren van febrik re. Di Emerikayê de 60 milyon xebatker hene û ji van hemîyan re kar peyda kirin ne tişteki hîsâniye. Hikûmetê Emerikayê niho, bi vi karê giran zehf mijûl e, à hîvi mezîn e ko ev pîrs bi awaki çak dê bête safi kirin.

Keçedînê

Keçedînê tu zanî
Esmer hilü tu zanî
Tez kuştim, fêz helandim
Tu b'kurmancî nizanî.

Tu di bû l'banê hanf
Xulama çavê di belek
Reş kir ji kîle sibbanî
Xulama şe biskî di şe

Li ser zîlfî danî;
Xulamê cotê memrika
Pirtiqalê yafayê
Devê dikanê danî.

A k'mi digo te anî
Sed helal be li wi canf
T'ez kuştim, fêz helandim
Çavreşê mala mi danî

Ez diçûme, diçûme
Pergî gewra xwe bûme
Ew keniya ez sa bûme.

Le gewrê lekexazale
Kanf rinda nav malê
Weyla mi memik xwarf
Memik fitara evare.

Keçez, dînî tu zanî
Tez kuştim, fêz helandim
Tu b'kurmancî nizanî
Esker oldim peyade

Tâ'lîm bilmem ne çare
Tez kuştim, fêz helandim
Tu b'kurmancî nizanî.

Denizde qum ziyyade
Esker oldim peyade
Senî çoq sevîyorum
Heyatden de ziyyade.

Were keçî vî alf

Tu b'kurmancî nizanî

Tez kuştim fêz helandim

Tu helal i vi canî;

HEJIROK

Ez hejîra na xwim
Loy, loy, loy
Loy li loy, loy loy !
Ez delalê na xwim
Xemrevînokê.

Şerî betal na kim
Tirka li xwe şa na kim
Xemrevînokê.

Hejîr li çiya ye
Li nav gul û giha ye
Li ber serê paşa ye
Ji eslî xwe de aña ye
Xemrevînokê.

Hejîr di tatê de
Delal di tatê de
Lawino biçin pê ve
Mexsedî dilî wê ye
Xortxapînokê.

Hejîr çiqa zer e
Wela delal zer e
Lawino biçin ser e
Ji eslî xwe de esmer e
Xortxapînokê.

Wela hejîr xwe e
Wela delal reş e
Li nav gul û benefîc e
Evdalê çavê di reş e
Eslî xwe de keles e
Xortxapînokê.

yê ko golîye: Ehmedê Ferman

TITIN

Ez radibim weqta seher
Qelûna min agir li ser;
Her nefesî ez dikşîm
Defî dike pênc sed keder.

Titina misk û elâ ye
Vedişwil şex û mela ye;
Kê dibéjît titin bela ye.
Ew ni zanî lezeti.

Melayê GERDİ

Hakim û Sê Keçik

Hakim, û wezir rojekê daketin seyranmış, di nav bexçan de.

Nérin ko sê keçik hene ji xwe re dolabê dirêsin. Hakim ji wezir re got: Emê xwe veşerin, binerin be, ev qızçı ji hev re dibêjin. Keçka wezir yek jê, yek keçka qadi ye, û a sisîya keçka gavanê bajêr e.

Nérin, keçka wezir ji hevalen di xwe re got: go heke hakimê bajêr me ez bikirima, minê jê re mexfûrek çekirina ko hindurê mala xwe, hemi pê raxistana, û derenceyêd mala xwe, heya bi hewşte...

Keçka qadi got, go: heger ez bikirima, minê jê re du zaro b'anîna, yek qız û yek lawik, her avdak ji porê wan yek zîv û yek zîr; û hakim dengê wan dibihâsin...

Hakim û wezir vegeryan mala xwe, û hakim ji wezir xwe re got: here keçka xwe ji mi re bine.

Wezir keçka xwe ji hakim re ani û mehra wêna li xwe bîr; évarê gava çû cem qizikê; jê re got; tu li ser soza xwe yi an na?

Keçikê jê re got: çi soz e! go: te di nav bexçan de got: heke hakim min bike, ezê jê re mexfûrekê çekim?

Keçikê go: mi derew ji xwe re kir! Ez çi zanim mexfûra çekim. Keçka qadi ji, bi vi haway!

Keçka gavan ani ji xwe re û jê re got: tu li ser soza xwe ye! Keçikê got: heke Xwedê bide, ez li ser soza xwe me.

Sala wê qediya, Xwedê teala du zaro dan keçka gavên; keskê din li cem wê tu ne, her du hewiyen wê pê ve.

Gava her du hewiyen wê din, ko keçka gavên soza xwe bi cih ani, pir jê qehirî, çûn du cewrik anîn û danfu ber wê, her du zarokên wê veşartin. Sindogek anîn, her du zaro xistin. Sindoq li wan girtin, qîr û zift kîrin û avetiñ behêr.

Çûn ji hakim re gotin: va jina te du cewrik jê re bûne.

Hakim pir qebiri, û çermeklî gamêşî ani û jinik xist nav vi çermî û danser cadê û emir daye ser bajêr, heç htere û heçtê tifkê bidin vê jinkê. Di bajare din de, yekî masîvanek heye, careki nérî ko sindoqek bi ser avê re té; ev sindoq ani û hat cem pîra diya xwe û jê re got; Xwedê da me. Gava sindoq-vekirin, nérî ko du zarok tê de ne.

Her yekî tiliya xwe xistiye devê û din, û dîmijin. Lawik û pîra diya xwe man ecibmayî li wan zarokan.

Ji diya xwe re got: edî tu karfu te ne ki, çavé te li wan zaroka be. Ev zaro li cem pîre mezin bûn, navê lawik danfne Ferzen-

de, û navê keçikê danfne Gulçîçek.

Heyanî ko mezin bûne, emrê wan bû deh sal, her du li hev ronîgtine û dibêjin; çawan bavê me tu ne, em ji pîre re dibêjin yadê, û ji lawê wêna re ji dibêjin yabو... bavê me kî ye, divê em seh bikin..

Çûn, cem pîre, her du û jê re gotin: yadê, ji me re rast beje, bê bavê me kî ye?

Pîre ji wan re got: ya rastî, ez nizanim; lawê min çû bû masîvaniyê, û nérî ko sendûqek, bi ser avê re té; û hon her du tê de bûn, em nizanîn bavê we kî ye; hon dixwazîn li cem me bîminîn, hon dixwazîn herin! Ferzende jê re got: pîre, taba xwe li me helal bike, emê herin!

Her du, Ferzende û Gulçîçek rabûn û bi dînayê de meşyan; ketîn Kerbelâ, hatîn ber çemekî mezin, nérin ko quesrek li ber çem heye; û wi alf cem, bajareki mezin heye.

Nérin ko quesir vala ye, banî ketin quesrê, ev û xweha xwe té de man, mişwarek xurt di, ve quesrê de wextê xwe borandine; ev bajar, bajare bavê Ferzende ye, Keçka wezir pê hesiya, ko du zarok hatîn vi bajari, seh kir ko ev zarok, ên ko avetîne avê... Kunclîn qîn li xwe kîrin û çû qesra ko Ferzende û Gulçîçek tê de ne.

Ji Ferzende re got: heyfa te, xortê delal, ko hespê te tu ne ye; divê tu heri, hespê qemer ji xwe re binf û lê siwar bi; encez minasibê te ye... Ferzende jê re got: pîre, hespê qemer li kî derê ye!

Pîre got: lawo heke te qesda ewî kir tê bibînî, ez ji nizanim li ku derê ye, dibêjin di bajare xerabe de ye.

Ferzende go: lazim ezê herim. Xweha wi jê re got: heke tu bi ya min dikî, tu na ri, tu zaro ye, tî li çoline bimîrî, herî kû? Ferzende go: nabe, ezê herim! Ferzende derket û bi çolê de meşya; qonaña du roja çû, geleki ti bu.

Nérî ko zelamkî ixtiyar li ser devê rê sekiniye; şerbiyekî avê pê re heye, giha cem kalo, xeyir hatîn tê dan, kalo av daye, û jê re got: ya xortê delal, tê herî kû? Ferzende jê re got: ezê herim hespê qemer!

Kalo jê re got: lawê min, ya xortê delal, gelek peyayîn weke te, çûne vi hespî û venegeriyane, tu ni karî bîni, vegere mala xwe. Go: na be; ezê herim.

Kalo nérî ko ra tê na be, go: de ezê mesela hespî ji te re bêjim; go ev hespî di bajare xerabe de ye, kesek ni kare wi zeff bike, niha dinya navê rojê ye, germe, niha li ber siha diwareki bilind e, çavé xwe bigir, ezê te li ber vi bajare xerabe deynim, here ser serî dîlwîr û xwe bavê ser piştî wîna, hespînne, ewê dihn bibe û bibeze, tu jê re bêj; ya heywanê delal, ji roja xulka te bûye, tu jibona min i, wê biskekine û tê bîni. ne qediyiye

Wey La Miro!


mûdiyi bike qerînê; bila komek giran ji wê der jî bicivînîn, şevkî ji esir pê ve, ji aliye qibilete de, li eskerén dewletê biteqfî nin, belki heyfa Smaî Begê, kekê Helef begî; apê Terhi begî; ji van teresê romiya hilfinin.

O, lo Miro ferman e; ferma-na serê Mirê min giran e;

Mi di, Small begî, sê denga ban dikir Helef begî; Xwedê hebîna, m' j' ter ne go tu ê wiha ne ki, tu rabî ban mele ki, bila kaxetkê binivîse, tu ê bidî destê xûlêm; bila berê xwe bide cem mala Haco Axa, bila komek giran ji wê der bicivîne, bila şevkê bêne Dêrizbîna xopan mîvandarî ne; a dinê şevê li qesra Kefir Hewara şewîfî, li Birca Belek dawetîli ne.

Bi ceplê wana bigirê, wan li sûka Qeyserîyan bigerînê, bila binîrin ji gewdan bê serî ne, û ji destan bê tilî ne, hemî kükîkê van M.... şerbesk in, aliye şexanî ne, dîlê wan res e, nava wan wek tenî ne, sed û adanîyê Xwedê li canê min keti be; ezê koka teresê wan M.... ji binf de, bîqelînim.

Wêne



Naqûşen İbadetgâhı

Elemana naqûş û ceresên ibadetgâhîn erden Ewripayê kom kiri bûn û dixwestin jê top û gulan çêkin. Xwedê ne bû yare elemana, û naqûşen komikirî vedigerin ibadetgâhîn ko jê hati bûn hilanîn.




Ceng Qediyya

Xelîn payetextî britanî ketîne nav kuce kolanan û sadimanî rojnamayîn ko dawîya şerî Pesifikî elamididin dixwin in. Japonia ji, mina elemanî, bê gotinîn kêm û zêde, xwe avetiñ bextê Hevalbendan.

Tefsîra Quranê

- 49- Pêxemberê min... Li wan mîze bike, çawan ew derewan bi alf Xwedê ve .didin; ji xwe ev gunehê wan, besi perşaniya wan e.
- 50- Ma tu li wan na nêri ko ji Tewrat û İncilê parmed bûbûn û niho radibin û bi pûten weke Cibît û Taşkûte baweriya xwe tînîn û dibéjin: Riya kafiran ji ya bawermendan rastir e.
- 51- Xuda ji wan standîye, ew ketine laneta Xwedê. Ji bona mirovén ko ji rehmeta Xuda hattine qewirandin, tu ni karf arka-reki peyda bikf.
- 52- Ma heke ew ji padîşahî û dewlemendiya dinê parmed bûna, gelo wanê ji kesî re pûlek bidaya.
- 53- Ma çire cuhf seba nimeta ko Xuda ji xelkê re da, dilrêş dibin û didexisin? Me ji malbatâ Ibrahimî re kitab û hikmet û padîşahîyeke mezin da bu.
- 54- Hinêni ji wan baweriya xwe bi bezma Muhammed anfine, lê hinêni din rûyê xwe jê zivirandine agîre dojehê besf wan e.
- 55- Yen ko ayetên me inkar kirine û pê kafir bûne, emê wan bavêjin agîre dojehê, û her cara ko çermê wan bête şewitandin, emê çermê di wan ji nû ve şin bikin, da ko ew lezeta agîr xweq tam bikin. Qudreta Xuda mezin e; Xuda zana û férîs e.
- 56- Lê yên ko bawermend bûne, û tiştîn qenc pêk anfine, emê wan bigehînin buhuştan têr av û kani, û ew tê de her bimînîn û di wan buhuştan de, ji bona wan jinêni paqîj û delal wê peyda bibin û emê wan bigehînin sihêne taze û honik.
- 57- Emre Xuda ye, gava ji we re tiştîk emanet dan, wf emanetî bidin xwedîye wi, û heke hon di nav xelkê de hikmî dîkin, hikma xwe li gora edaletê bikin. Ev emrén Xuda ciqas delal
- Ü heja ne. Xuda bîna, bîhistiyar, û zana ye.
- 58- Gelf bawermendin... Ji Xuda, pêxember û mezinîn û xwe re itaetê bikin, û heke we baweriya xwe bi Xuda û roja piştawiyê anîye, gava hon li ser mes'elekê li hev na yin, bi ya Xuda, û pêxemberê wi bikin, bi vi awayî hon digehin rastiyê û xeyrê diblin.
- 59- Ma tu wan na bînf ko zen dikirin heçko baweriya xwe bi kitêba ko ji te re û bi kitêben ko beriya te dahatîne anf bûn; û niho radibin û dixwazîn li gora hikmî Taxtûte bimeşin? Ji wan re hati bû emir kirin ko wan divê Taxtûte inkar bikin, lê şeytan dixwaze ko ew ji riya rastiyê derkevin; jê dûr kevin, û riya xwe şas bikin.
- 60- Gava ji wan re tête gotin: bîkevin piyey Qurana ko Xuda nazîl kiriye û bidin pey pêxemberê Xwedê, tu dibîni ko minafîq rûyê xwe ji vê ronaihyê dizivîrlin
- û xwe ji vê baweriya pak bi şûnda dikîşînîn.
- 61- Ew, pişî ko mala xwe bi destê xwe xira dîkin, radibin tê 'nik te û dibéjin: Qesda me lihevhatina mirovan bû û em tiştîk ko xilâfi emrê te ye na kin.
- 62- Xuda tiştîn ko ew di dilê xwe de vedişerîn pê dizane, guh me de wan, wan bi şîretan bişidîne û bi gotinîn geş dil û guhê wan veke.
- 63- Ji şandina pêxemberan qesda me ew bû ko xelk jê re itaetê bikin. Heke yên ko gunehkar û ezabdârén nefsa xwe bûne, tê nik te û ji Xwedê efîw û tobardixwazîn û dikevin bextê te û mehdîra te hêvî dîkin, wê bîbînîn ko Xuda efîw û tobardide wan, Xwedî piyâr û mehrivan e.
- 64- Bi Xwedê, li ser tiştîn ko ew li hev hatine, heta ko tu hîkmê xwe ne dî, ew pê qail na bin, ew baweriya xwe na yênin; lê piştî hîkmî te, di dilê wan de, şik na mîne, û ew bi dil û zîman qail dibin, û dikevin bextê te.
- 65- Heke me ji wan re bigota: xwe bikujin an ji welatê xwe derkevin, hînekî wan wîsa dikir le heke wan li gora şîretâ me bikiranâ, di heqê wan de çêtir dibû û baweriya wan pê zexm dibû.
- 66- Me ê ji wan re sewabén mezin bidaya.
- 67- Me ê wan bigihanda riya rasîtiyê.
- 68- Yen ko itaetî Xuda û pêxember dîkin, hevalen nîmetgîhayen Xuda ne, ew hevalen pêxemberan, bawermendan, şîhidan û qendîkerâne. Ew, ci hevalen delal û spehi ne.
- 69- Kerema Xuda wîsa ye, û tiştîn ko em dîkin, Xuda bizane, bes e.
- 70- Gelf bawermendin... Xwe pêk bînîn, çekîn xwe hilgîrin, heydan û heybeta xwe bidin neyârén xwe û gava hon diçin pêşîya wan, kom bi kom an bi teway herin.
- 71- Yen ko bextresî kirine û xwe ji şerî dane paş, gava ji we refî musbetek dîgehe dibéjin: Destîşandîna me ji şerî, ji kerema Xuda ye, an ne, ji me re ji, belayek wê bigîhiştâ û em ji şehîd bibûna;
- 72- Ü gava hon dijminen xwe dişkînîn û talanê wan tînîn û ji we re gencyekê dîgehe, ew dibéjin: her cend ji, di nav beynâ me û wan de tu hevalîfînîne, xwezi em bi wan re bîmana, û ji talanê behreke mezin bistanda.
- 73- Yen ko jîyîna axiretê, ji heynâna dînyâyêtî dirigirin, divê di riya Xwedê de, dest bi şer û kuştinê bikin; yen ko di Xwedê da têne kuştin û yên ko zora dijminen xwe dibin, bila bizanîn ko ji bona wan sewabeke mezin heye.
- 74- Ma ci li we qewimiye ko hon, ji bo xelasî û azakirina qelsenîr û jin û zaroyan, dest bi şer û kuştinê na kin; ma hon na bîfî

MIRÉKA CIHANÉ



Bergehek ji mehkema Mareşal Peten, di Parisde de. Peten giha bû hela payega Mareşalîye: û xelkê Frensiye jê zehf hez dikirin, ew payedariya serfirâya Ordîgen Frensiyi a 1914-1918-an bû. Di vi şerî de ew rabû destê elemana girt û bê beztil li welatê xwe kir û divîya bû bête kuştin, lê her weki getek pîr e, ne hatîye mirandin; heta dawîya emrê xwe de hebse de, wê bîmine.

Strana Kurdi

BÊMÂLE

Lawik ban dikirê keçikê, digo: bêmal ez û tu ne; di vi weletâ me de, bêmal ez û tu ne; te ne mérî, û mi ne jîn; tu rabe destê xwe bîde destê min e...

Emê, ji vi weletâ birevine; ji xwe re herin weletâ din e; xelk û alemî ji dê û bavê min û te bipirsin e...

Wê bêjin çavê reg û belek, fro sê ro, xerîb ketine, li weletâ xerîb û xurbetê; dinya û alemî, li serê min û te bîcivine...

Wê bêjin, lawo, belao, hon ji kû ne? Wê gave, emê bêjin, em xwîşk û brayê hev û du ne, em ji ber zîlm û zulematen tirkâ direvine; wê bêjin: şîklê we, mîna şîklê hevîdu qe na bine; wê gave emê bêjin: gelf xelk û alemîne, bavê me yek in, diyîn me dido ne.

Lawik ban dikirê, lê, lê keçikê; di ser min û te re, Rebê Alemî mezin e, di bînya min û te re, kar û ber zîlm û bîzin e; de rabe, destê xwe bîde destê min, talîya dînyâyêtî mirin e.

Bejna Zirav, ji xwe re rûniştiye, li ber qesrê, dawa têqî daye ber sîtarê...

sin ko ew ji Xwedêye xwe re dia dîkin û dibéjin: Yezdanê me, me ji vi bajarê ko rûniştiyanen wf zâlim in derîne û ji me re arşkar erî şermîyanekî bîfîne, da ko em pê zora dijminen xwe bibin.

75- Yen bawermend, di riya Xuda a rast de, û yên kafir di riya Taxtûte a xwar de dest bi şer û kuştinê dîkin. Gelf bawermendin... dirêjî hevalen şeytân bikin û bizanîn ko hilebaziya Iblîs kurt û sist e.

76- Ma tu li wan mîze na ki... yên ko berîji wan re hati bû gotin: niho dev ji şer û kuştinê berdin û dest bi kirina nimêjê û dana zekâtê bikin; piştre gava ji wan re bi şer û kuştinê hate emir kirin, hin ji wan rabûn û xelkê tîrsandin, bi tirsekê ko mirov pê ji Xuda dîtirse an bi tirsekê jê hêj mezintir, û digotin: Xudayê me, tu cîma ji me re, emî kuştinî dîfî, xwezi te bîhisîte. Metu ji mirovan re bi pêxemberîtiyê şand, Xuda gahidê pêxemberîtiyâ te ye, û ev besf te ye.

Destpêka Tefsîre di hejmara Hawarê de hatine çap kirin. Hejinâr 27. û heta 57.

Lawik ban dikirê, lê, lê keçikê, mala bavê şewitiyê; de rabe ramisanekê bi mi dê, évar e, dereng e, roka me ne ma, ketiye hikmî évarê; heval û hogirê me; ji çola berê xwe dane malê...

Lê, lê bêmale, roka me ne ma, heyva me yê çardeşevê, sewqa xwe dayê, weletâ Kurdistânê, çol û çiya û dar û devî.

Lawik ban dikirê, digo: gelf heval û hogirno, werin emê herin Şerîta Mihemedî, biner dê Xelkê Delal, ji kê re dikevi.

Cigareyên Tamdar

Cigareyên çetir û tamdar, yên Rejiya Libnan û Sûriyeyê ne. Jokey-Klub, Yekemîn, Befra, Tatî-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyak; ev cigareyên he hemî, ji titinên çetir û paktir tene çekirin. Pişti xwarîne cigareke baş, dilê cigarevexwaran vedike.

Gava dixwazîn cigarekê vexwin, navêni Jokey-Klub, Yekemîn-Birinci, Befra, Tatî-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyak bînîn bîra xwe û yek ji wan paketan, ji xwe re bibijerîn.

Mal û xweziyâ dinya tiştîk hindik û kêmeyar e, ji bona bawermendan ko ji Xudayê xwe tîrsiyar in heynîna axiretê tiştîk çetir û spehlîr e, û bizanîn ko ji xwe re tu neheqî na ye kirin.

77- Hon her kû derê ji bibin, di asegehîn mezin de ji xwe veşerin, mirin nîzîki we dibe û hon dimirin. Gava gencyek dîgehe we bêjin : ev ji kerema Xwedê ye, û gava xirabiye tê serê we bêjin ev ji ji vi ye; ûtu, pêxemberê min, bêje: Her tişt ji Xuda ye, û her tişt bi emrê wi çedibe. Ma ev ci mîletek e ko mana gotinekê ji seh na ke, û pê brewer na be.

78- Her ci qencya ko dîgehe te ji kerema Xuda ye, û her ci xirabiye ko dîgehe te kedê nefsa te ye, ango Xuda bi wê bîlaye, te diceribne. Metu ji mirovan re bi pêxemberîtiyê şand, Xuda gahidê pêxemberîtiyâ te ye, û ev besf te ye.

Gerandina Dewletekê

Wezirê paşojmendiyê, serekê wezareta paşojmendiyê ye. Dewlemendkirina welateki kareki gelek girane ye. Da ko pereyê miletteki xwediqsimet bimine, divê ev pere di welatén biyanî de ji, xwediqsimet bibe. Xwediqsimetbûna pere bi qudraeta xwe a kîrînê girêdayî ye.

Emê bêjîn ko hikûmeteke kurdi hatiye danîn û pereyê kurdi diçe bazarên biyanî. Heke hatina Kurdistanê pir in û haq in, xelk bi vi pereyî ji kurda hûr û mûra, pez û dewaran, mexfûr û xalîçan dikirin, her tiştê ko hewcedar in jê tînin, û bi vi awayf qedre pereyê kurda tête girtin.

Lê, heke kurd, di welatê xwe de, xweq na xebitin, zad û xwarin, pez û dewar, hîrî û hevrîşim û zayeyên wan ên din kêm in, û xelk bi pereyîn kurdi ni karin tiştîkî hêja bikirin; qîmeta perê kêm dibe û kurd bi xwe tiştîn ko hewcedar in, ji welatén din, ni karin binin ji ber ko, qîmeta pereyîn wan hindike û ew kêmrekbet e. Heke wilo ba, di welêt de ziwarî û perşanî destpê dike.

Qidret û qiweta miletekî, li gora xebata lebaten vî mileft ye. Heke hemşîriyên erdektî, bi tevayı û bi zêrekî, li gora qeydeyên zanîn û mehreşefî dixebitin, û di hundirê welet de, hatina erdê, hatina gund û bajaran, destgeh, karxane û febrîqan pir û başi in, ev milet di nav mileten Cihanê ên din de dibe dewlemend û di nav nijadan de, xwedi qedir û rûmet.

Wezîre karên cîvaki, serekê wezareta xwe ye. Milet divê bixe-bite, divê saxeleme be. Xaniyên xelkê, xaniyên gundi û xebatkeran, xaniyên hemî rûniştiman, divên bi awakî çak bêne ava kîrin. Mirov na be ko xaniyan de rûnin, ko pencereyên wan nîne, dû û dûman, toz û ax, bîhnîn genî têde ne. Ker û dewar, pez û golik nabin ko rast bi rast di tenîta xelkê malî de bixwîn û vêxwin, û tiştîn mayî bikin.

Di Malâ her gundiyeke de, divê ji geneve du mezel, hewsek û deh mêtir ji van mezelan dûr axûrek hebe. Heywan û lîsan na be ko, bi gev û bi ro tenîta hev de mîna hevala rûnin. Gava zaro tên dînyayê, divê diktorek vi zaroyî biblue; ji bona dûrkirina nesaxiyân jê re, derziyek an dide lêxe.

Zaroya divê hero du car bi sabûnê bêne şüştin, cihê wan divên gelek paqîj bin, mêt û kelmês van aciz ne kin. Şîrê ko ji wan re tete dayîn, divê bête kelandin.

Avrîjên xaniyan divê ji maşa dûr bin, û çaleke wan i kûr hebe, gava di avrîjê de kes tune, texseyek divê bête dayîn kulê avrîjê. Demen nexweşiyen giran de, xelk divê bîkevin xestexanan; angô divê xestexaneyine baş bêne çekirin; û ji bona nesaxiyine biçûk, yêngî ko heke mirov bala xwe ne da, dibin nexweşiyine dijwar, mîna eşa çavan, ta, bîrlînîne biçûk, nexweşîya zaroyan dermanxaneyan têne vekirin.

Herweki, insan ne heywan e, û ne heq e ko ji tâba miroveki, mirovine din kar bikin û peyayê ko dixebite dawî ji nanê tîfî pêve nikare tiştîkî bixwe, nikare ji bona jîn û zaroyen xwe ên nesax diktor û dermana bîne, keç û kurênen xwe bişîne xwendegahan, ji xwe re, û ji zar û zêcén xwe re, nikare cilekî pakij û nû bikire, di sefîrî û perşanîyê de bimîne, wezareta cîvaki li van tiştan dinêre; û bernade ko tiştîn wilo çêbibin, xelkê digihîne xweşîyê, nizam û intizamê û wan berxurdar dike.

Her kesê ko dixebite, divê bikare mîna insanan bijî, di paqîj, raheti, selameyi û kamiraniyê de emrê xwe derbaz bike, qedre wi bête girtin û kes bê sebebeye qanûnî, têkîf wi ne be.

Ev in karên hêja ko pê karker û diwanên wezareta cîvaki mijûl dibin, xelk bi şfret, qanûn û arîkariya di wê pêg ve dikevin. Bîşik, dewletekî divê bixe-bite, lê xelq ji divê arîkariya wê bikin, dako di navbirâ milet û hikûmete de tevkariyekê çak hebe û pêşveçûn çênbî. Wezirê kevne û mehkeman, serekê wezareta xwe ye. Herweki di nav xelkê de, doz û dehwa çêdibin, saffkirina van doz û dehwan, li gora qanûn û istilênen danî, karê mehkeman e, û mehkeme bi tevayı girêdayî wezareta kevne û mehkeman e.

Hakim an qadî, divêna li gora qanûnen welet, heqê xwediyê heq bînîn cib, û bidîn, kes di welet de, heqşenandî ne mîne, her kes bigehe heqê xwe. Di pêsiya mehkeman de, biçûk û mezin, sefîr û dewlemend, xurt û qels nîne. Bê qerara mehkemekê kes nikare bête eşandin.


Bî qerara mehkemekê mirov súçdar, dikeve hebsê û tête kuştin ji. Lê tu car cendirmeyek an polisek li peyakî ni kare lêxe, an dijûnan lê bike. Ev ne heq û hedê tu kesîye. Lê ji aliyê din gava polis an cendirmeyek neheqî kir, mirov dikare gazinda jê bike, di heqê wi de, dehwayek rake.

Her tiştî bi isûl û qanûn e, bi isûl û qanûn tête meşandin. Te divê qedre mêmbrêne dewletekî bigiri, wan ji divê qedre te bigirin. Mezinahiya kesî li ser kesî nîne. Wexte zor û zorkerî ji mîj ve horî ye.


Ji yê ko xwedî heq e, xurtir kes nîne, lê heke tu dixwazî bi dara zorê bigehe heqê xwe, heye ko heqê xwe winda dikî. Bindesiya qanûn û nizaman bike û ko te wila kir bizane ko şah û padışah ji te ne xurtir in.

Kevnezan

PÊJINÊN DINYAYÊ



Ser qedîyay; host û qesîrbendên ingilz, dest bi selîndîna avahîyên bombexistî kirine; di payetxte Britanya Mezin, der nîzîngî İbadetgeha St. Paul, x-bateke zor û bi seqwî, pêş ve diçê; xelk dixwazîn bajareñ xwe bi swaki, ji yê bers hêj cêtir û çelengtir ava bikin. Bi çîqasî bextiyar in ew peyayê ko ji bona miletê xwe dixebitin.



Xebatkerê denîmerki ji bona balafîrvanê ingilz payedarıyek dârlîne, li ser ki virî hatîge nîvisandin; ji bona xelast û serbestîga welatê me, em şikirdari xwedê ne. Ji peravên Ingilistânê 'balafîrvanê' britanî çek û sileh, şur û xencer, bombe û mitralyoz anîne ji me re, da ko em bikarin, welatê xwe, erdê kal û kalîkên xine ji destê neyaran, ji destê zalîm û xedaran xelos bikin, wan balafîrvana canê xwe dane, heta ko em aza û serbest bibin, ew iro di erdê welatê me de, hatine vezartîn; xwedê rûh û gîyanê wan şâ bike.



Di Rangâne de, eskerên britanî, şabûniya xwe elam didin. Cenga japonan qedîyaye, japon bîmecal ketîne erdê, û di pêsiya cihauê de, dergehîn silîh û aştîliyê, azahî û serbestiyê vebâne.